

**Wezareta Karûbarê Zarokan, Malbatê,  
Penaberan û Hevguncînê  
Ya Herêma Nordrhein-Westfalen**

**11.12.2020**

**Agahdarî ji bo dayik û bavên**

ku zarokên wan li baxçên zarokan û cihên xwedîkirina zarokan têne guhdankirin.

**Agahdarî ji bo xwedan, rêvebirî û karmendên**

baxçên zarokan û cihên xwedîkirina zarokan

**Girtin ji 14.12.2020 heta bi 10.01.2021**

Ev pandemiya Korona wisa çalak e, ku me îsal her û her neçar dike, ku em di demeke kurt de tevbigerin û biriyaran bistînin. Niha jî wisa li me hatiye. Ji ber ku careke din ev vîrûs bi şêweyek zêde berbelav dibe û rewş li beşên çavdêriya tendirustî ya çir li nexweşxaneyan me neçar dike, ku em van pêngavan bidin. Divê jiyana civakî heta ku mecal hebe, were sistkirin. Guhdana zarokan li baxçên zarokan jî dikare di vî warî alîkar be.

Ji ber vî hawî ji 14.12.2020 heta bi 10.01.2021 ev têbiniyên xwarê ji baxçên zarokan re misogirin:

- Ew demên girtinê yê hatîn plankirin divê werin cîbecêkirin.
- Xizmetgûzariyên guhdana zarokan nayên girtin, anku guhdana zarokan (wek li dema beharî) nayê qedexekirin.

- Misogirkirina guhdanê bi vî rengî ye: ew zarokên, ku divên bi her hal herin baxçên zarokan, dê cihek ji bo guhdankirina wan hebe.
- Heger pêdiviya dayik û bavan bi guhdankirinê hebe, ew dê vê alîkariyê bistînin. Ev tişt hem ji bo sedemên şexsî jî derbas dibe. Çênabe ku ji ber girtinê (Lockdown) ziyan bighêje yek zarokî bi tenê jî. Têkiliyeke pêbawer bi baxçeyê zarokan re yan bi wan kesên pisporên xwedîkirina zarokan re deynin, yê ku zarokên we li ba wan têne guhdankirin.
- Lê hema ev dezgehên guhdankirina zarokan dê ji 14.12.2020 heta bi 10.01.2021 karên xwe heta ji wan tê kêr bikin.
- **Ji ber vî hawî em bangî dayik û bavan dikin, ku bi tenê hingî sûdê ji vê xizmetgûzariyê bikin, heger ev yek ji bo wan gelekî pêwîst be.** Ji ber li dema Cejna Hezretî Mesîh (Weihnachten) û li demên di navbera herdu salan de bi her hal ji bo gelek malbatan rojên betlanê ne û gelek malbat li mal de ne. Em hêvî ji hemî dayik û bavan dikin: sûdê ji hemî derfetên din yê li ber dest bikin, taku hun karê xwe û guhdankirina zarokên xwe li hev bînin û heger mecalê we hebe, zarokên xwe nebin baxçên zarokan!

**Wezaretê Karûbarê Zarokan, Malbatê, Penaberan û Hevguncînê  
ya Herêma Nordrhein-Westfalen**